

ANALÎZA KRÎTÎK A VEGOTINÊ

Jaffer Sheyholislami

(Werger ji îngilîzî bo kurdî: Mehmet Yonat)

Sheyholislami, J. (2017). Analîza Krîtîk a Vegotinê (Critical Discourse Analysis). Wergêr: Mehmet YONAT. Di nav *Gotarên Zimannasîyê* de. Ed. Subaşî. K. û Geyik. R., n.r.: 241-261

Li gor van Dijk (1998a) Analîza Krîtîk a Vegotinê (AKV) qadek e ku metnên nivîskî û gotinî dixebite û analîz dike da ku çavkaniyên vegotinî yên quwet, hakimiyet, newekhevî û pêşdaraziyan derxe meydana. Ew (AKV) pey wê tiştê ye ka gelo çawa ev çavkaniyên vegotinî, di nav peywendên taybet yên civakî, polîtîk û dîrokî de berdewam dikin û ji nû ve tîn hilberîn. Di heman çarçovê de, Fairclough (1993) AVKê wiha terîf dike;

Analîza naverokî ku armaca wê bi awayeke sistematîk kişfkirina wan tîkiliyên xumamî ye ku di navbera sebep û encamê de heye, û dîsa kişfkirina tîkiliya pêvajoya navbera (a) metn, bûyer, pratîkên vegotinê û (b) avanî, tîkilî û pêvajoyên firehtir yên civakî û çandî de ye. Vê jî ji bo lêkolîna wê tiştê dike ka gelo metn, bûyer û pratîkên ji hêla tîkiliyên hêzê (power) û mucadeleyên li ser hêzê çawa derdikevin meydana û ji hêla îdeolojîk ve çawa şikl digrin. Wexta ev tê kirin armacek jî kişfkirina wê tiştê ye ka gelo xumamiya tîkiliya di navbera vegotin û civakê de çawa hegemonya û quwetê diparêze. (r. 135)

Bi gotinek asan ve, armaca AKVê zelalkirina tîkiliya di navbera pratîkên vegotinê, pratîkên civakî û avaniya civakî de ye ku ji hêla însanên neprofesyonel ve zelal nînin.

Guherîna AKVê

Di dawiya salên 1970yî de, Zimannasiya Krîtîk (ZK) ji hêla grûpeke zimannas û teorîstên edebiyatê yên li Zanîngeha East Angliayê (University of East Anglia) ve hate avakirin (Fowler et. al., 1979; Kress & Hodge, 1979). Nêrîna wan li ser Zimannasiya Fonksiyonel ya Sîstemîk (ZFS) (Systemic Functional Linguistics (SFL)) ya Halliday hate avakirin. Armanca pratîsyenên ZKê wek Trew (1979a, r. 155) gotî, ew bû ku “îzolekirina îdeolojiya di nava vegotinê de” û nîşandana “ka gelo pêvajoya îdeolojiyê xwe çawa di nava sîstema karakterîstîk û pêvajoya ziman de nîşan dide.” Vê armancê ji hêla amûrên analîtîk yên ZKê (Fowler et al., 1979; Fowler, 1991) yên li ser ZFSê hate pêşxistin.

Bi şopandina rêça Halliday ev, ev pratîsyenên ZKê zimên bi sê fonksiyonan ve bikar anîn; fikrî (ideational), navşexsî (interpersonal) û metnî (textual). Li gor Fowler (1991, r. 71) û Fairclough (1995b, r. 25) her çiqas fonksiyona fikrî refereyê tecrubeyên axêver yên derbarê dunyayê û fenomenên wê de bike jî, fonksiyona navşexsî di hundirê xwe de tevgerên nirxandinên axêver yên derbarê fenomena behskirî dihewîne û têkiliyekê di navbera axêver û guhdarvan de ava dike. Tiştên van herdu fonksiyona bi hev ve girê dide jî fonksiyona metnî ye. Bi fonksiyona metnî ya ziman ve, axêver dikare metnekî çêke ku ji hêla guhdaran ve tê fêmkirin. Ev fonksiyon dihêle têkilî di navbera vegotinê, û kontekst û metnên din de were danîn.

Nêrîna Halliday ya ku zimên wek “tevgereke civakî” dibîne, di nav pirî piratîsyenên AKVê de merkezî ye (Chouliaraki & Fairclough, 1999; Fairclough, 1989, 1992, 1993, 1995b, 1995a; Fowler et al., 1979; Fowler, 1991; Hodge & Kress, 1979). Li gor Fowler et al. (1979), Zimannasiya Krîtîk (ZK) wek zimannasiya civakî, vê îddîa dike ku “di navbera avaniya zimanî û ya civakî de têkilieke zexm û berbelav heye” (r. 185). Lê, di zimannasiya civakî de “konseptên 'zimên' û 'civat'ê ji hev cuda ne... loma jî di vê nêrînê de analîstvan li ser 'têkiliya di navbera herduyan de' disekine”, lê ji bo ZK "Ziman perçeyêke bingehîn ya pêvajoya civakî ye" (Fowler et al., 1979, r. 189).

Îddiayek din ya bingehîn ya AKVê û ZFSê ew e ku axêver peyv û rêzimanek bikar tînin, û di hilbijartina wan de çî zanatî çî nezanî wê li gor “etîk û sîstemek” dikin (Fowler et al., 1979, r. 188). Loma ev hilbijartinên wan li ser îdeolojiyê ava dibin. Li gor Fowler et al. (1979), "hilbijartina naverok û formê ne rasthatîye û edetî ye, ... lê şiklê dide naveroka îşaret û îmayan" (r. 188). Bi kurtasî, ziman tevgereke civakî ye û ji hêla îdeolojiyê ve bi rê ve diçe.

Pêşdaçûyînen Zêdetir di AKNê de

Di salên dawî de, ZK û bi navê wê yê nû ve AKN (Chouliaraki & Fairclough, 1999; van Dijk, 1998a) zêdetir hat pêşxistin û firehkirin. Xebatên dawiyê hin tiştan li xebatên ZKyê yên berê zêde kir.

Di nav van de, ya ewil, analîza rola vegotina guhdar û şîrovekeran e ku muhtemelen ji ya analîstvanên berê zêdetir e. Ya duyem, firehkirina şumûla analîzê ji analîza metnî ber bi analîza navmetnî ve ye.

Fairclough (1995b) behsa herdu mijaran kiriye. Ew îddîa dike ku xebatên berê yê ZKê baş li ser 'pratîkên şîroveker yê guhdaran' nedisekinî. Bi gotinek din, Ew îddîa dikir ku bi piranî ZK di wê fikrê de bû ku guhdar metnan bi awayê analîstvanan şîrove dikin. Di heman rêçê de, Boyd-Barrett (1994) di şîroveya xwe ya li ser Fowler (1991) de dibêje ku "meyleke xetayê di qebûla 'xwendineke şablonî' de heye an jî di bingehe analîza metnên de 'bandora' medyayê" heye (r. 31).

Mijareke din ya ji hêla Fairclough ve hatiye pêşkeşkirin ev e, her çiqas xebatên berê yê ZKYê zêdetir li ser analîza leksîkal û rêzimanî bûn, lê kêmîtir li ser navmetniyê hûr dibûn: "analîza zimannasiyê zêdetir li ser rêzikên hevokan disekine û kêmîtir bala xwe dide tiştên asta bilind yê hemû metnê" (r. 28). Her çiqas mijarên bi xebatên ewil yê ZKê ve eleqedar zêdebin jî, Fairclough (1995b) lê zêde dike; "behsa van kêmasiyan nayê wê wateyê ku serkeftinên zimannasên krîtîk kêmbûye — Bîlaqis ew di van bîst salên dawî de ji hêla teoriyê ve gelek pêş ketine" (r. 28). Pêşketina ji hêla teoriyê ve ku Fairclough behs kirî, bi avakirina îskeleteke teorîk ya tekane ve encam neda. Tiştê ku wek AKN tê zanîn li gor Bell & Garret (1998), "ne ekolek serbixwe ye, lê nîşandana bi awayek herî baş ya bergeheke hevpar e ku gelek nêrînan di nav xwe de dihweîne" (r. 7). Dîsa, van Dijk (1998a) dibêje me ku AKN "rêyek taybet ya lêkolînê ye" loma jî "Ew xwediyê avaniyek teorîk ya hevpar nîne." Lê, van Dijk vê jî lê zêde dike, "Eger bergeha berbelav û armancên gelenper yê AKNê were dayîn, dibe ku em bikaribin avaniya teorîk û konseptê giştî bibînin."

Fetlên di ANKê de

Yên di pêşdeçûyîna ANKê de herî zêde bi bandor bûnin ev in; van Dijk (1988, 1991, 1993, 1995, 1998b, 1998a), Wodak (1995, 1996, 1999) û Fairclough (1989, 1992, 1995a, 1995b, 1999).

Van Dijk (Modela Sosyo-cognitive)

Di nav pratîsyenên AKVê de, van Dijk kesek e ku ji kesên herî zêde refere tê kirin. Dîsa, her çiqas bi AKVê re zêde hev negire jî, di xebatên krîtîk yê vegotina medyayê de jî ji wî gelek jêgirtin tên wergirtin (mesela, Karim, 2000; Ezewudo, 1998). Di salên 1980yan de, ew dest bi tetbîqkirina teoriya xwe ya analîza vegotinê bo metnên medyayê kiriye ku piranî li ser temsîliyeta grûpên etnîk û kêmaniyên Ewropayê ne. Di analîza wî ya *Analîza Nûçeyan (News Analysis)* (1988) de, ew teoriya xwe ya gelenper ya vegotinê entegreyê vegotina nûçeyên çapemeniyê dike û teoriya xwe tetbîqê rewşên pêkhatî yê nûçeyan dike û vê hem di asta netewî hem jî di ya navneteweyî de dike. Tiştê ku avaniya van Dijk (1988) ji analîzên vegotina nûçeyan cuda dike, xwesteka wî ya ji bo analîzeke hûrgilî ye ku ne tenê vegotina medyayê di asta metnê û avaniyê de analîz dike, lê di heman demê de, di asta têgihîştin (comprehension) an hilberîn û "xerîdariyê" de jî dike (Boyd-Barrett, 1994).

Bi analîza îskeletî ve, van Dijk îdddîfaya analîza 'îskeletê di astên cuda yê terîfkirinê de' dike, yanê ne tenê di asta rêzimanî, fonolojî, morfolojîk û semantîk de dike lê heman demê de, di 'asta herî bilind de dike' wek hevhatîf (coherence), temaya giştî, mijarên nûçeyan, hemû formên şematîk û bergehên retorîk yê metnê. Ev analîz jî li gor wê yê têrê nekira, lewra,

Vegotin ne tenê metnek îzolekirî û avaniyek diyalogî ye. Ji vê zêdetir, ew bûyerek têkel ya comînkasyonê ye ku di nav xwe de kontekstek civakî, taybetiyên beşdaran (û hebûnên (properties) beşdaran) û dîsa pêvajoya hilberîn û xerîdariyê dihewîne. (van Dijk, 1988, r.2)

Bi 'pêvajoya hilberînê' tiştê ew îma dike pratîka rojnamegerî û înstîtusyoniya nûçeçêkirinê û pratîkên aborî û civakî ne ku ne tenê di afirandina vegotina medyayê de xwediyên rolek girîng in, lê di heman demê de, bi awayek zexm bi avaniya vegotina medyayê re jî eleqedar in.

Nêrîna din ya analîza van Dijk, 'pêvajoya standinê' ye ku di nav xwe de têgihîştin, 'ezberkirin û jinûvehilberîn' a nûçeyan dihewîne. Tiştê analîza medyayî ya van Dijk (1988, 1991, 1993) dixwaze terîf bike, têtikiliyên di navbera sê astên hilberîna metnên nûçeyan (pêvajoyên avanî, hilberîn û têgihîştinê) de ye û têtikiliya wan ya bi konteksta firehtir ya civakî re ye ku wan di nav xwe de dihewîne. Bo terîfa têtikiliyên bi vî rengî, analîza van Dijk, di du astan de pêk tê: asta avaniya biçûk (microstructure) û avaniya mezin (macrostructure).

Di asta avaniya biçûk de, analîz li ser têtikiliyên semantîk yê di navbera fikr, sentaks, leksîkal û elementên din yê retorîk de disekine ku ev mîzaneke mantiqî dide metnê û hin elementên din yê retorîk, wek jêgirtin, gotinên yekser an neyekser (direct or indirect reporting) ku rastiyek didin nûçeyan.

Di nav analîza nûçeyan ya van Dijk de, avaniya mezin cihek merkezi digre, lewra ew têtikilî di

navbera avaniya tematîk/mijarê ya nûçeyan û şema wan ya giştî de datîne. Tema û mijar di sernivîsan (headlines) û paragrafên ewil de tê ferqkirin. Li gor van Dijk (1989), sernivîs 'lihevhatina giştî yan yekgirtîtiya semantîk ya vegotinê terîf dike, û dîsa terîfa agahiyên xwîner dide yên ku herî baş hatiye ezberkirin' (r.248). Ew îddia dike ku sernivîs û paragrafên ewil,

li ser agahiyên herî girîng yên modela têgihîştinê ya rojnamevanan dide, yanê, ka ew çawa bûyerên nûçeyan dibînin û terîf dikin. Eger xwîner xwediyê agahî û baweriyên cuda nebe, ew bi piranî van terîfên medyayê yên bialî adapte dikin ku ew terîf di bûyereka de kîjan agahî girîng in, wan nîşan didin. (van Dijk, 1988, p. 248)

Li gor van Dijk (1988, r. 14-16), şemaya nûçeyan ('Suprstructure schema') li gor şablonên taybet yên vegotinan (narrative) şikl digre ku ji van tê avakirin: kurte (sernivîs û paragrafa ewil), çîrok (rewşa naveroka epîzot û paşxaneyan) û encam (şîroveyan dawî û encam). Ev beşên nûçeyekê di çarçoveya 'têkiliyê' de ji bûyerê hatiye derxistin, loma agahiyên gelenper di nav kurteyê de yanê nav sernivîs û paragrafên ewil de ne. Li gor van Dijk, tişt ku xwîner herî baş ezber dike û bibîr tîne, ev e.

Di eslê xwe de, van Dijk (1995) analîza vegotinê wek analîza îdeolojiyê fêhm dike, lewra li gor wî, 'îdeolojî bi awayek tîpîk, lê ne tenê îdeolojî, di nav vegotin û komînîkasyonê de tê gotin û ji nû ve tê hilberîn ku di nav peyamên semiyotîk yên ne-gotinê wek wêne, fotograf û filman de jî tîpîk dîtin' (r. 17). Nêrîna wî ya analîza îdeolojiyan sê perçeyan dihewîne: analîza civakî, analîza têgihîştinê (cognitive) û analîza vegotinê (1995, p.30). Analîza civakî dixwaze terîfa 'avaniya civakî ya giştî' (kontekst) bike, analîza vegotinê bi taybetî li ser metnê ava dibe (sentaks, leksîkal, semantîkên lokal, mijar, avaniya şematîk, û hwd). Di vê rewşê de, nêrîna van Dijk bi du nêrînan berê ve hev digrin: şîroveker (avabûna li ser metnê) û tradîsyona civakî (avabûna li ser kontekstê). Lê, tişt ku van Dijk cuda dike di AKNê de taybetiyeke din ya nêrîna wî ye: ananlîza têgihîştinê.

Li gor van Dijk, têgihîştina civakî (sociocognition) ku têgihîştina civakî û ya kesî dihewîne, civatê û vegotinê tîpîk ber hev. Ew têgihîştina civakî wek 'sîstema pêşkeşkirina zîhnî û sîstema pêvajoya endamên grûbê' dibîne (r. 18). Di vê çarçovê de, ji bo van Dijk 'îdeolojî ... sîstemên giştî û yên razber yên zîhnî ne ...ku tevgerên hevpar yên civakî organîze dike' (r. 18). Loma, îdeolojî di nav tevgeran de 'bi awayek ne-yekser bandorê li têgihîştina kesên endamê grûpê' dike (r. 19). Navê 'model'ê li vê têgihîştina zîhnî ya şexsan dike ya ku di pêvajoya têkiliyên civakî de dertê meydanê. Li gor wî, 'model; kirin, gotin, an nivîsên kesên û fêmkirina pratîkên civakî yên kesên din kontrol dike' (r.2). Li gor van Dijk, tişt herî girîng jî li vir ev e ku "model" ji hêla bergeha "em" li hember "ew" tê avakirin û bi vê jî endamê grûpek bi gelemperî di wê meylê de ne ku grûpa xwe bi gotinên erênî û grûpên din jî bi gotinên neyînî îfade bikin (r.22). Analîz û diyarkirina nêrîna 'em' li hember 'ew', di gelek lêkolîn û nivîsên van

Dijk de ciheke merkezi digire (1988, 1991, 1993, 1995, 1996, 1998a, 1998b). Bi baweriya wî, ji bo kesek bikaribe dikatomiyeke îdeolojîk zeel bike, divê gavên jêr tetbîq bike (1998b, r. 61-63):

- a. Terîfa konteksta vegotinê: paşxaneyê dîrokî, polîtîk an civakî ya gengeşiyê û beştarên wî yê bingehîn.
- b. Analîza grûpan, têkiliyên hêzê û gengeşiyên di nav wan de.
- c. Diyarkirina fikrên erênî û neyînî derbarê “em” li hemberê “ew” de.
- d. Zelalkirina îma û pêşqebûlan.
- e. Vegotina hemû avaniyên formal: hîlbijartinên leksîkal û avaniya sentaktîk, bi wê awayê ku fikrên grûpa polarîzebûyî derdixe meydanê.

Wodak (Vegotina Zimannasiya Civakî (Discourse Sociolinguistics))

Vegotina Zimannasiya Civakî fetleke AKNê ye ku bi Wodak û hevkarên wê yê Viyanayê (Dibistana Viyanayê ya Analîza Vegotinê) re tê behskirin. Wodak modela xwe li ser ‘zimannasiya tradîsyona Bernsteinian û fikrên Dibistana Frankfurtê bi taybetî yê Jürgen Habermas ava dike’ (Wodak, 1995, r.209). Li gor Wodak (1996, r. 3):

Zimannasiya Vegotinê... zimannasiyek e ku ne tenê bi awayeke hûrgilî xebatên metnan yê di kontekstê de dike, lê di heman demê de, eyarê dide herdu faktorên ku di qiyametê de wekhev in. Ev nêrîn dikare mekanîzmayên bingehîn terîf û diyar bike ku di rastkirina tevliheviyan de alîkar dibe. Ev tevlihevî di nav kontekstên taybet de – dibe ku hem di nav avanî û fonksiyona medyayê de hem jî di nav înstîtusyonên wek nexweşxane û dibistanan de be – derdikeve pêşberî me û bivênevê bandorê li komînkasyonê dike.

Wodak lêkolînan li gelek înstîtusyonên cuda wek dadgeh, dibistan û nexweşxane, û li ser mijarên civakî yê cuda wek seksîzîm, nijatperestî û antî-Semîtîzmê kirine. Xebata Wodak ya li ser vegotina antî-Semîtîzmê ya di sala 1990an de bûye sebeb ku nêrîna wê ya *metoda dîrokî ya vegotinê* derkeve meydanê. Peyva *dîrokî* di vê nêrînê de cihek taybet digire. Di vê nêrînê wî de, ew ‘bi awayek sîtematîk hemû agahiyên paşxaneyî entegreyê hemû astên metna nivîskî û gotinî’ dike (1995, p. 209). Encamên xebata Wodak û hevkarên wî (wodak et. al., 1990) nîşan dide ku konteksta vegotinê bi awayekî aşkere

bandora xwe li ser avanî, fonksiyon û konteksta îfadeyên anti-Semîtîk heye (p. 209). Di pêvajoya terîf û şîroveyê de li ser konteksta dîrokî ya vegotinê hûrbûyîn, taybetiyeke vê nêrînê ye ku wê ji nêrînên din yê AKVê cuda dike, bi taybetî jî ji van Dijk.

Di nêrîna *metoda dîrokî ya vegotinê* de (wek ya Fairclough) ev bawerî heye ku ziman 'têkilî û pêvajoya civakî nîşan dide' û 'di nav xwe de' wan pêvajoyan jî dihewîne (Wodak & Ludwig, 1999, r. 12). Li gor Wodak & Ludwig (1999) nêrîna li ziman ya bi vî awayî bi xwe re herî kêr sê tiştan tîne. Ya ewil, vegotin 'her wext di nav xwe de hêz û îdeolojiyê dihewîne. Tu têkilî tune ku têkiliyên quwetê di nav de cihek bilind negire û norm û qiymetên wê rolek nesitîne' (r. 12). Ya duyem, 'vegotin her wext dîrokî ye, yanê, ew bi bûyerên komînkatif re bi awayek senkironîkî û diyakironîkî peywendîdar e ku ew bûyer ya di heman demê de pêk hatine an jî beriya wê pêk hatiye' (r. 12). Ev dişibe fikra navmetnî ya Fairclough ku em ê behsa wê bikin. Taybetiya sêyem ya nêrîna Wodak şîrove (interpretation) ye. Li gor Wodak & Ludwig (1999) xwîner û guhdar li gor paşxaneyê wan ya agahî, zanîn û statuyê dibe ku şîroveyên cuda ji bo heman bûyera komînkatif bînin (r. 13) Loma, Wodak & Ludwig (1999) îddîa dikin ku 'şîroveya RAST tune; bergehê hermenotîk lazim e. Şîrove dibe ku kêr zêde qebûldar be lê nikare bibe rast' (orîjînalê wê de wiha ye) (r. 13). Ev xal ji hêla Fairclough (1995b, r. 15-16) ve jî hatiye behskirin.

Fairclough

Nêrîna sêyemîn ya bingeîn ya AKNê ya Fairclough e ku teoriya wî di zêdetirê deh salên dawî de di AKNê de ciheke merkezî de ye. Fairclough, di xebatên xwe yê ewil de, ji bo nêrîna xwe ya ziman û vegotinê gotina *Xebata Krîtîk a Ziman* bikar dihanî (1989, r.5). Ew armanca vê nêrîna xwe wiha terîf dike 'zêdekirinek li bilindbûna gelenper ya hişmendiyê têkiliyên civakî yê li ser şêlandinê avabûyî, bi hûrbûna li ser ziman ve' (1989, r. 4). Bi taybetî ev armanca wî di xebatên wî yê dawî de pêste diçe û niha nêrînên wî avaniyeke kamilbûyî ya AKVê ye (Fairclough, 1992, 1993, 1995a, 1995b; Chuliaraki and Fairclough, 1999). Di vê beşê de, ez ê bi gelenper behsa xebatên Fairclough yê AKNê bikim û agahiyên zêdetir ji bo analîza vegotina medyayê bidim, lewra ev ê bingeê îskeleta wê avaniyê bide min ku ez ê di vê xebatê de bikar bînim.

Li gor Chuliaraki û Fairclough (1999), AKN 'di nav îskeleteke analîtîk û teorîk de zanistên civakî û zimannasiyê tîne cem hev û diyalogek di navbera wan de datîne' (r. 6). Teoriya zimannasiyê di vê derê de referiyê Zimannasiya Sîstematîk ya Fonksiyonel (ZSF) (Systematic Functional Linguistics (SFL))

dike ku ji bo îskeleta analîtîk ya Fairclough bingehe û dîsa jî bo pratîsyenên din yê AKNê jî wisa ye (Fowle et. al., 1979; Fowler, 1991; Hodge & Kress, 1979). Nêrîna Fairclough ji gelek teorîstên kirîfîk yê civakî jî sîd wergirtiye, wek Foucault (konseptên *rêza vegotinê (orders of discourse)*), Gramsci (konseptên *hegemonyayê*), Habermas (konseptên *kolonîzekirina vegotinê*) (Fairclough, 1989, 1992, 1995a, 1995b).

Chuliaraki û Fairclough (1999) îddîa dikin ku AKV metodeke kêrhatî ye. Ew dibêjin ‘bîst salên dawî, di asta gerdûnî de, perîyodek guherîna civakî û aborî bû’ (r. 30). Ew di vê baweriyê de nin ku her çiqas ev guherîn ji ber hin kirinên însanan çêbûne jî, guherîn wek “perçeyek xwezayî” hatiye nirxandin (r. 4), yanê, guherîn û transformasyon xwezayî hatiye dîtin ne ji ber kirinên îsananan hatiye dîtin. Guherînen dawiyê yê aborî û civakî, li gor Chuliaraki û Fairclough (1999), “heta cihek ... transformasyonên di ziman û vegotinê de ne” (r. 4), lewma, li ser avaniya ka însan çawa dikarin jiyana xwe saz bikin û ji nû ve saz bikin, afirandina hişmendiyê “çi ye, çawa bû û divê çi bibe” tê çêkirin. AKN jî alîkarê vê afirandina hişmendiyê û teorîzekirina transformasyonan dibe (r. 4). Bi armancek vî awayî ve, Chuliaraki û Fairclough îddîa dikin,

AKN têkiliyeke komînîkatîf e ku dixwaze nîşan bide ku taybetiyên semiyotîk û zimannasiyê bi awayek sîstematîk bi qewimandinên civakî re têkildar in û qewimaninên civakî jî bi temamî an qismen bi tiştên semiyotîkî û zimanî ve têkildar in. Bi awayek din, AKN bi awayek sîstematîk tabloya têkiliyên transformasyonên di navbera tiştên sembolîk û ne-sembolîk û tiştên vegotinî û ne-vegotinî de xêz dike. (r. 113)

Di vê nêrîna AKNê de, di analîza bûyereke komunîkatîf de sê fokûsên analîtîk hene. Ew *metn* (nûçe), *pratîka vegotinê* (pêvajoya hilberîn û xerîdariyê) û *pratîka sosyoçandî* (avaniyên civakî û çandî ku bûyera komunîkatîf derdixin meydanê) (Fairclough, 1995b, r. 57; Chuliaraki & Fairclough, 1999, r. 113). Ev gelek dişibin sê bergehên van Dijk yê analîza îdeolojîyê: bi rêzê *vegotin*, *têgihîştina civakî*, û *analîza civakî* (analîza avaniya civakî). Tiştên cuda ya bingehe ya di navbera nêrînen Fairclough û van Dijk de nêrîna duyem e ku herduyên din tîne ber hev. Van Dijk *têgihîştina civakî* û *modelên zihnî* wek gîhanekên navbera vegotin û civakê de dibîne, lê Fairclough di wê baweriyê de ye ku vê peywirê ji hêla pratîkên vegotinê ve – hilberîn û xerîdariya metnê – pêk tê (Fairclough, 1995b, r.59). Di vê rewşê de, herdu nêrînen AKNê “konseptên wan eynî” ye (Fairclough, 1995b, r.59)

Îskeletên Fairclough bo Analîza Bûyereke Komunîkatîf

A) *Metn:*


Fokûsa analîtîk ya ewil ya modela sê-perçe ya Fairclough metn e. Analîza metnê di nav xwe de analîza zimaniyê dihewîne ya ku di çarçoveya peyv, rêziman, semantîk, sîstema dangan û organîzasyona giştî de tê kirin (Fairclough, 1995b, r. 57). Analîza zimanî li ser leksîkal-rêzimanî û hebûnên semantîk yê metnê tê kirin û ev herdu li ser hevdu xwediyê bandoreke wekhev in (r. 57-58). Di rêça ZSFê de, Fairclough metnê bi berhehek multîfonksiyonel ve dibîne. Li gor Fairclough, hevokeke di metnekê de dikare di çarçoveya pêkhatina van fonksiyonan de were analîzkirin ku ew van navan li wan fonksiyonan kiriye; *pêşkeşkirin (representations), têkilî (relations), nasname (identities)*:

- Pêşkeşî û ji nû ve kontekstkirineke xûsûsî ya pratîkên civakî (fonksiyona îdealîzekirinê) – dibe ku di nav xwe de îdeolojiyan bihewîne.
- Avakirineke xûsûsî ya nasnameyên xwîner û nivîskaran (wek mînak, ka divê li ser çi zêdetêr were sekîn – li ser statû û rolên nasnameyan an jî li ser şexsiyetan were sekîn)
- Avakirineke xususî ya têkiliyên di navbera nivîskar û xwîner de (wek mînak, resmî an ne resmî, nêz an dûr). (Fairclough, 1995b, r.58)

Li gor Fairclough (1995), analîza zimanî çawa li ser tiştên heyî yê di nav metnê de disekine, her wekî wê li ser tiştên tuneyî jî disekine ku dibe ku ew metn di nav xwe de “pêşkeşî, kategoriyên beşdar, avaniyên nasnameyên beşdar an têkiliyên beşdar” bihewîne (r. 58).

B) *Pratîka Vegotinê*

Li gor Fairclough (1995, r. 58-59), du aliyên vê nêrînê hene: *pêvajoya înstîtusyonî* (prosedurên edîtorîyal) û *pêvajoya vegotinê* (guherîna metnan bo hilberîn û xerîdariyê). Ji bo Fairclough, li aliyeke pratîkên vegotinê civat û çand heye û di aliyê din jî ziman, metn û tiştên din heye, wek tabolya jêrê.



Îskeletek bo analîza krîtîk ya naverokê ya bûyerek komînîkatîf (Fairclough, 1995b, r.59)

Di çarçoveya vegotina medyayê de pêvajoya înstîtusyonal, wexta jêrê ez behsa îskeleta Fairclough ya bo analîza vegotina medyayê bikim, wê zêdetir behs bikim. *Pêvajoya vegotinê* bi consepteke bingehîn ya nêrinên wî ve yanê bi *navmetnî* ve wê baştir were terîfkin.

Navmetnî û analîza navmetnî

Di vê îskeleta analîtîk de, di alîkî de analîza zimanî ya di asta metnê de di aliyê din de analîza metnî ya di asta pratîka vegotinê de heye ku Fairclough ji vê re 'analîza navmetnî' dibêje (1995b, r. 61). Li gor Fairclough (1995b),

Analîza navmetnî li ser sînorên di navbera metn û pratîkên vegotinê yê di nav îskeleteke analîtîk de disekine. Analîza navmetnî bi bergeha pratîka vegotinê ve li metnê dinêre û di metnê de li pey şopên pratîkên vegotinê dikeve, (r. 16)

Li gor Fairclough, 'analîza zimanî di xwezaya xwe de terîfker e lê analîza navmetnî zêdetir şîroveker e' (r. 16). Fairclough (1992, r.84) navmetniyê wiha terîf dike, 'Di eslê xwe de hebûnên metnê bi qevşên

din yê metnên din ve tije ne û dibe ku ew qevş gelek aşîkar di wê metnê de werin xwiyânê û ew metn wan qevşan asîmîle, red û bi awayek îronîk tekrar û hwd bike.

Fairclough du cure navmetniyan diyar dike: 'navmetniya manîfest' û 'navmetniya bingeh (constitutive)'. Ya ewil refereyê avaniya heterojen ya metnê dike ku 'metnên spesîfik yê din di nav metnekê de bi eşkere xwe nîşan dide'. Navmetniya vî rengî bi sînyalên aşkere ve xwe nîşan dide wek jêgirtin û nîşanên hebûnên metnên din. Di aliyê din de, navmetniya bingehîn refereyê avaniya heterojen ya elementên derveyî metnê (tîpên bingehîn) yê rîza vegotinê dike (navvegotinî)' (r. 104). Ev cure navmetnî refereyê avaniya bingeha vegotinê dike ku hilberîna metnên nû dike.

Fairclough (1992) çend mînakên pêvajoyên van navmetniyan dide. Ew gotarekê analîz dike ku di rojnameyek netewî yê Brîtanyayê, *The Sun*, de derketiye û ew gotar li ser dokumanek resmî ya derbarê maddeyên hişbir de hatiye avakirin ku ji bo parlamentoya Brîtanyayê (British House of Commons) hatiye amadekirin. Tiştên ew dîtî du xal in: (1) Hin formên zimanî henin ku dokumenteke resmî temsîl nakin. Ew gotar niv-raporek e ku divê derbarê mijarê de be, lê tiştên di wê de ne bi temamî dokumenta resmî temsîl dikin; (r.2) loma di wê de hin nîşanên semantîk û zimanî hene ku gotinên *The Sun*ê bi gotinên dokumenta resmî ve nîşan didin. Ev jî delîlek e ku tiştên *The Sun* dibêje û tiştên dokumana resmî dibêje di heman rêçê de ne û ev jî dibe sebep ku *The Sun* gotinên rapora resmî wek gotinên xwe nîşan bide. Lê di heman demê de, *The Sun* xwerû gotinên dokumentê tekrar nake, lê tiştan ji nû ve rêz dike û wan bi gotin û zimanê xwe ve dibêje. Rojname, vê bi du awayî dike (I) bi guherîna zimanê resmî û qanûnî ber bi zimanê rojane û sohbetê (Wek 'tacîrên maddeyên hişbir (traffickers)' dibe 'Qaçaxçî (Peddlers)', (II) bi guherîna monologên nivîskî yê dokumanek resmî ber bi diyalogek sohbetê. Yanê, Rojname dokumanek resmî ber bi sohbetek populer werdigerîne ku ji xwînerên wê yê taybet û sadiq re cazîp tê. Ev mînaka navmetniyê nîşan dide ku her çiqas rapora *The Sun*ê li ser metnek hatiye avakirin jî, lê ew wê werdigerîne li ser îfadeyên bersivên dahatûyê, xwestekên xwînerên xwe û vê jî bi wergerandina metna orjînal ber bi tîpa vegotina xwe ve dike.

Fairclough (1995, r.189) dibêje ku hebûnên navmetniyê yê metnek di 'taybetiyên wî yê zimanî' de tê xwiyânê, lewra tê îddîa kirin ku 'mumkun e ku metn ji hêla zimanî ve heterojen be'. Lêbelê, Fairclough vê jî dibêje,

Analîza zimanî di xwezaya xwe de terîfker e, di aliyê din de analîza şîrove yî zêdetir şîroveker e. Taybetiyên zimanî yên metnek wan delîlan dide ku dikare di analîza navmetnî de were bikaranîn û analîza navmetnî dikare van delîlan şîrove bike... (r.61)

C) *Pratîkên sosyoçandî*

Li gor Fairclough (1995b, r. 62) analîza vî rengî sê bergehên kontekstên sosyoçandî yên bûyerek komunîkatîf nîşan didin: bergeha aborî (aboriya medyayê), bergaha polîtîk (hêz û îdeolojiya medyayê) û bergeha çandî (mijara nirxan). Li gor Fairclough, Kesek nikare di hemû astan de analîzê bike lê di wê astê de dikare ku 'bi mijara berdest re eleqedar e' (r. 62). Ev konseptên anaxtar yên pratîkên sosyoçandî wê li beşên di çarçoveya analîza medyayê de werin nirxandin.

Hizrên zêdetir ji bo analîza vegotina Medyayê

Fairclough (1995b) îddia dike ku 'nirxandina komunîkasyonê ya di medyaya girseyî, divê aborî û polîtîkaya medyaya girseyî têxe nav hesab: xwezaya bazarê ku medyaya girseyî di wê de control dibe û têkiliyên bi dewlet û hwd ve pêk tînin' (r. 36). Di nav taybetî û hebûnên medyaya girseyî de yên ku balê dikişînin ev in; *nifûza* medyayê, *aboriya* medyayê, *polîtîka* medyayê û pratîkên *hilberîn û xerîdariya* metnên medyayê.

a. *Nifûza medyayê*

Mijareke girîng ku divê li ser were sekinîn *nifûza medyayê* ye: kî nifûzê medyaya girseyî dike û texmînên ku dibin bersiva vê pirsê, cihê medyayê yê di civakê de nîşan didin. Wek Fairclough (1995b) dibêje, gelek şexs û grûpên civakî henin ku di çarçoveya nivîsîn, xeberdan û wêşanê de, bi awayek wekhev nifûzê medyayê nakin. Fairclough îddia dike, ji ber vê yekê 'berhemên medyayê di bin kontrolê profesyoneltir û înstîtasyonaltir de ye û bi gelenperî kesên ku formên din yên aborî, polîtîk û çandî yên hêzê di destê xwe de digrin, herî zêde nifûzê medyayê dikin' (r. 40). Li gor van Dijk (199?)¹ wek mînak, nifûza vegotinê di medyayê de jî girîng e. Lewra,

¹ Ev ji malperek van Dijk hatiye standin, <http://www.hum.uva.nl:80/~teun/beliar.eng> dîrok nehatiye dayîn. Dîsa, lînkê ve gotarê di sala 1998an de ji vê malperê <http://www.aber.ac.uk/media/Sections/textan02.html> hatiye daxistin ku îddia dike ku ev gotar di sala 1980yan de hatiye nivîsîn. Lê belê min ev gotar di dîroka 8/14/2000an de daxist.

Nifûza vetotinê ji bo însanan çavkaniyeke civakî ya mezin e û bi gelenperî elît dikarin nifûzê wê bikin. Kontrola vî rengî hem taybetyên kontekstê (Cih, Wext, Beşdar) hem jî taybetiyên din yê metnê (mijar, stîl û hwd) di nav xwe de dihewîne. (r. 10)

b) *Aboriya Medyayê*

Hebûneke din ya girîng ya medyayê jî aboriya wê ye, lewra li gor Fairclough (1995b), 'aboriya înstîtusyonek faktoreke girîng ya pratîk û metnên wê ne' (r. 40). Medyaya girseyî ne îstîsna ye. Wek înstîtusyonên karî yê din, medya jî xwediyê berhemek firotinê ye. Berhema wan xwînerên reklaman in (Chomsky, 1989; Fairclough, 1995b). Wek encam, li gor Fairclough, medyaya girseyî 'ji bandora pêkûtiyên tîcarî re gelek vekirî ye' (r. 42). Mesela, ji bo çapemeniyê ev cure bandor di biryara hilbijartina nûçeyan de û di hilbijartina riya çapemeniyê de dibe ku bibandor be (Fowler, 1991, r. 20). Ev mijara bandorê ya bergeha aborî ya medyayê, bi taybetî pratîkên wê yê reklaman, di xebatên krîtîk yê medyayê de merkezî ye (Achbar, 1994; Chomsky, 1989; Hackett, 1991; Winter & Hassanpour, 1994).

Bi mijara reklamê ve eleqedar, mijara xwedîbûna medyaya girseyî, li gor pîrî analîstan li ser vegotina medyayê bibandor e (Fairclough, 1995b, r.43; chomsky, 1989; Hackett, 1991, r. 64; Winter & Hassanpour, 1994). Li gor Fairclough, li Rojavayê (West) şîrketên mezin xwediyê pîrî medyayên tîcarî ne. Wek mînak, li gor Winter & Hassanpour (1994),

Du şîrket (zincîra Southam û şîrketa Thomson – xwediyê *Globe & Mail*ê nin), xwediyên % 59 yê surkulasyona rojnameyên Kanadayê nin û ew bi awayek zexm bi îndîsturiyên derveyê rojnameyan ve eleqedar in û ji hêla elîten şîrketê ve tîrêvêbirin. (r. 15)

Bandora xwedîtiya înstîtusyonan 'xwe gelek awayan nîşan dîke, wek mînak organîzasyonên medyayê di bin bandora wan kesan de ava dibe ku hêza wan a polîtîk û civakî heye û ew dikarin nifûzê medyayê bikin..' (Fairclough, 1995, r. 43)

c) *Polîtîka medyayê*

Li gor Fairclough (1999b, r. 36) divê polîtîkaya medyayê jî di analîza medyayê de werê hesabandin. Gelek analîstvan (Chomsky, 1989; Fairclough, 1995b; Fishman, 1980; Fowler, 1991; Hackett, 1991; van Dijk, 1991, 1993), dibêjin ku medyaya giştî ya tîcarî bi awayek îdeolojîk dixebite û di xizmeta elît, dewlet û kesên bi hêz de ye. Fairclough (1995b) îddîa dîke ku vegotina medyayê 'ji nû ve hilberîna tîkiliyên

civakî yên domînansê û şêlandinê' dike (r. 44). Di heman demê de, Wî ev çavnêrî kiriye ku hin caran menfaetên medyayê bi yên dewletê re li hev diqelibe. Mesela di bûyera herba Vîyetnamê de, televîzyonên Amerîkayê bi nîşandana wêneyên herbê ve, fikra giştî diqelibandin li dijî herbê (Fairclough, 1995b, r. 45). Gowing (1991) û Schorr (1991) behsa bandora televîzyonê dikin û di sala 1991î de mudaxeleya rêveberiya Bush bo alîkariya penaberên Kurd yên Bakurê Iraqê mînak didin.

Chomsky di vê baweriyê de ye ku bi awayek periyodîk krîtîka dewlet û şirketên bingeîn ji hêla medyayê ve, perçeyek doktrîna grûpên elît yên domînantin ku 'xwe bi awayek hêrs wek axêverê axavtina azad û menfaetên gelenper yên civakê nîşan didin' (ji Achbar, 1994, r. 53). Heman krîtîka medyayî qebûl dike ku dewletên Rojava medyaya girseyî dikte nakin. Nexwe ka çawa medya dikare bibe instrumentek bihêz?

Ji bo terîfa vê rewşê, Fairclough û analîstvanên wek Hackett (1991) li pey şopa konseptê *Hegemonyayê* ya Gramsci çûne. Wek van Chomsky (1989) û van Dijk (1998) li ser hêza medyayê ya *hilberîna lihevkerinê* dikin. Li gor Fairclough & Chuliaraki (1999),

Hegemonya têkiliyên domînansê yên ku ne li ser zerp û zorê lê li ser îqnayê hatiye avakirin, di nav xwe de paratîkên naturalîzasyonê û têkiliyên wan dihewîne. Loma konseptê hegemonyayê di berdewamkirina têkiliyên domînansê de li ser girîngiya îdeolojiyê disekine. (r. 24)

Li gor Hackett (1991), medyaya merkezi 'nûnerên hegemonya'yê nin (r. 56). Li gor Hackett, tu hêz nikare bi quwetê xwe ebediyen berdewam bike. Wek wî çavnêrî kirî, ev rastî bi taybetî ji bo dewletên demokratîk rast e wek DYA û Kanada ku xelqê wan xwenda ne û xwediyê dîrokeke azadiya xweîfadekirinê ne û xwediyê heqê hîlbijartinan e (r. 56-57). Di van welatan de, çîna rêveber ji bo îqnakirina fikra gel û berdewamkirina domînansa xwe pêdivî bo medyaya girseyî heye ku elementeke bigehîn ya afirînerê vê konseptê ye (Chomsky, 1989; van Dijk, 1998a; Hackett, 1991; fowler, 1991).

d) *Pratîkên hilbertîn û xerîdariya metnên medyayê*

Hilbertîn û xerîdariya metnên medyayê du perçên din yên girîng yên pratîka medyayê û înstîtasyonên wê ne. Hilbertîn di nav xwe de rûtînên înstîtasyonel dihewîne, wek civandina nûçeyan, hîlbijartina nûçeyan, nivîsîn û edîtkirin (Fairclough, 1995b; Fowler, 1991; van Dijk, 1993). Xerîdarî di eslê xwe de referesyê awayê xwendin û têgihiştina metnê yên xwîner dike.

Hilbijartina nûçeyan pratîkek girîng ya hilberîna metnê ye. Medyaya girseyî bi piranî xwediyê gelek keresteyan e. Loma jî hemû tişt nikarin bibin nûçe û werin çapkirin. Di çarçoveya hilbijartina krîteran de, li gor Carruthers (2000, r.16) û Eaman (1987, r. 51), qiymeta nûçebûyîne ne taybetiyeke xweyî ya bûyer û maddeyên nûçeyan e. Nexwe, 'bûyer wexta ji hêla pratîkên nûçeyan ve tî guherandin dibin nûçe, ne ku ji ber taybetiyên wan yê bêalî... nûçe bi qasî ji bo xizmeta mentaetên çîna rêveber tî afirandin' (Eaman, 1987, r. 51). Wek encam 'dunyaya çapemeniyê ne dunyaya rast e, lê dunyayek sînorkirî ye ku 'hatiye berovajîkirin û qanûnîkirin' (Fowler, 1991, r. 11)

Hilbijartina ji hêla rojnameger û medyayê ve di nav xwe de hilbijartina çavkaniyên agahiyan jî dihewîne, wek mînak, wê bi kê re gotûbêj were kirin, ji kê jêgirtin û nûçe were standin. Li gor Fairclough (1995b), 'taybetiyeke girîng ya hilberîna nûçeyan bi giranî girêdayê rojnamevan û hejmareke kê ya peywirdaran e û dîsa çavkaniyên wê jî di nav konek tîkiliyan û proseduran de sînordar e' (r. 49).

Berevajiyê peywirdaran, kesên ji rêzê, wexta wek çavkanî tî hilbijartin, bi piranî fikrên wan yê derbarê mijarek de na, lê tenê ji bo xeberdana wan ya tecrubeyên wan yê şexsî destûr tî dayîn (Fairclough, 1995b, p. 49). Fairclough (1995b) û Fowler (1991, r.22-23), vê avakirina çavkaniyên agahiyan a li ser peywirdarên medyayê bi statukoyê re girê dide da ku xwedîtiya wê medyayê di destê xwediyê wî de bimîne û di kara xwe de berdewam be. Li gor Fairclough, encamên vê 'esasen bergeheke avakirî ya dunyayê û nîşandana wê ya di metnê de ye, mesela, awayê dayîna gotinekê' (1995b, r.49).

Wexta nûçeyek kete pêvajoya hilberînê, ji bo xendin û fêmkirinê tî amadekirin; yanê, ji bo xerîdariyê tî amadekirin, lê ka gelo ew ê çawa were xerîdarkirinê bi taybetî pirî caran di merkeza gengeşiyên analîza vegotina medyayê de cih gitiye (Boyd-Barrett, 1994; FAirclough, 1995b; Fowler, 1991; Widdowson 1998). Analîstên vegotinê derbarê xwendin û tîgehîştina xwîneran ya metnê de texmînan dikin. Tişt girîng di vir de ev e ku anasîst yê çawa bizanibe ka xwîner çawa vegotina medyayê hildide û ji vegotinê çî û çawa tîdigihêje yan jî ev cure xeber bandorên çawa li wan dike. Bi min, hemû analîst, pratîsyenên AKVê jî di nav de, di vê de hemfikir in ku krîtîka AKNê li beranberê analîstên vegotinê hatiye avkirin ku ew jêderxistinên xwe li ser şîroveyan ava dikin û vê jî li gor bandora vegotina medyayê ya li ser xwîneran dikin (Fairclough, 1996; Widdowson 1995). Pratîsyenên AKNê di serî de divê vê qebûl bikin ku xwînerên cuda dibe ku heman metnê bi awayên cuda fêmkirin (Fairclough, 1995b, r. 15-16). Di heman rêçê de, van Dijk (1993) dibêje 'xwîner û temeşevanên medyayê çalak (in) û heta cihek bi azadî agahiyan bikar tînin' û dibe ku ew form bidine şîrove û fikrên nûçeyên ji hêla rojnamevanan ve hatine çêkirin (van Dijk,

1993, r.242). Ev jî vê encamê derdixe ku ne pêkan e mirov bêje ka însan nûçeyan çawa dixwînin û şîrove dikin.

Lê, pratîsyenên AKNê ji ber hin sebebên dibe ku di baweriyê de bin. Ev sebeb herî kêr du heb in. Ya ewil, xwîner bi gelenperî ji bo xwendineke krîtîk ya metnek nehatine perwerdekirin (Fowler, 1991, r. 11; van Dijk, 1991). Ya duyem, xwîner metnan li gor agahiyên paşxaneyê xwe û agahiyên derbarê wê mijarê de dinirxînin (Van Dijk, 1993, p. 242) Bi awayek îronîk, li gor van Dijk, 'ji bo tîpên taybet yê bûyerên civakî û polîtîk... medyaya nûçeyan çavkaniya eslî ya agahî û baweriyên e ku di şikldayîna îskeleta şîroveyên bûyerên vî awayî de çalak in...' (van Dijk, 1993, r. 242-243) analîz û terîfa vegotina medyayê di texmînên derbarê bandora medyayê ya li ser xwîner û gudan de dibe ku alîkarê me be. Fairclough wê îddîyê red dike ku metnek tena serê xwe tu meneyek xwe tune, bê ku şîroveyên xwîner hebe (1995b). Ew dibê,

Her çiqas gelek xwendinên cuda hebin û her xwendinek berhemeke mudaxaleyekê be ku di navbera hebûnên metnê û çavkanî û pratîkên şîroveyê de bin ku ev şîrove bi metnê ve eleqedar e lê rêjeya şîroveyên potansiyel li gor xwezaya metnê tê sînordarkirin û li gor wê dikeve li ser rêçek. (r. 16)

Dîsa Fairclough di wê baweriyê de ye ku xebatên rûbirû (reception) (wek mînak, pirskirina xwîner û temaşevanan ji bo şîroveyên wan yê metnê) dibe ku di diyarkirina wate û bandora metnê de alîkarê analîstê vegotinê be. Lêbelê, dîsa ew di vê baweriyê de ye ku eger analîsta metnê bi analîza hilberîn û xerîdariya ve were kirin, divê analîza metnê di analîza medyayê de elementa merkezî be (Fairclough, 1995, r. 16).

Prensîbên AKNê

Di encama vê beşê de, prensîbên AKNê ku ji hêla pratîsyenên AKNê ve (Fairclough, 1995a; Kress, 1991; Hodge & Kress, 1993; van Dijk, 1998a; Wodak, 1996) li ser hatiye sekinin, bi vê awayê kurtasiya wê dikare were dayîn:

1. Ziman pratîkeke civakî ye ku bi wê dunya tê temsîlkirin.
2. Bikaranîna vegotinê/ziman wek formeke pratîka civakî ne tenê pratîkên din yê civakî temsîl dike lê di heman demê de pratîkên din yê civakî pêk tîne wek pekanîna quwet, domînasyon, pêşdarazî, berxwedan û hwd.

3. Metn wateyên xwe bi têkiliyên diyalektîk yê navbera metn û mijarên civakî ve dest dixwe: nivîskar û xwîner, ku her wext bi dereceyên cuda yê hîlbijartin û nifûza metnê û meneya şîroveyan ve têkilî datînin.
4. Taybetî û avanîyên zimanî ne rasthatî (arbitrary) ne. Ew li gor armancek hatine çêkirin û ev dibe ku bi qest an bê qest hatibe kirin.
5. Bi vegotinê têkiliyên hêzê tên hilberîn, tên kirin û ji nû ve tên hilberîn.
6. Hemû nivîskar û axêver bi formên taybet yê pratîkên vegotinê ve têkildar dibin û ev pratîk ji menfaetên taybet û wan armancan pêk tên ku di nav xwe de hewandin (inclusions) û avêtinan (exclusions) dihewînin.
7. Vegotin dîrokî ye. Di wê çarçovê de ku metn wateyên xwe di kontekstên taybet yê civakî, çandî û îdeolojîk de û dîsa di cih û wextê xwe de distîne.
8. AKN ne tenê *şîroveya* metnê dike, lê di heman demê de wan *terîf dike*.

Çavkanî

- Boyd-Barrett, Oliver (1994). Language and media: a question of convergence. In David Graddol & Oliver Boyd-Barrett (eds.). Media Texts: Authors and Readers. Clevedon: Multilingual Matters Ltd. (pp.22-39)
- Chouliaraki, L. & Fairclough, N. (1999). Rethinking Critical Discourse Analysis. Edinburgh: Edinburgh University Press
- Fairclough, Norman (1989). Language and Power. London: Longman
- Fairclough, N. (1992). Discourse and Social Change. Cambridge: Polity Press
- Fairclough, Norman (1995a). Critical Discourse Analysis: The Critical Study of Language. London: Longman
- Fairclough, Norman (1995b). Media Discourse. London: Edward Arnold
- Fairclough, Norman (1996). A reply to Henry Widdowson's "Discourse analysis: a critical view". Language and Literature, 1996, 5 (1): 49-56
- Fowler, R. and B. Hodge (1979). Critical linguistics. In R. Fowler et al (Eds.). Language and Control. London: Routledge and Keegan Paul. pp. 185-213
- Halliday, M.A.K. (1994). Introduction to Functional Grammar. London: Edward Arnold.
- Hammersley, Martyn (1997). On the foundations of critical discourse analysis. Language & Communication, vol.17, No.3:237-248
- Hodge, Robert and Gunther Kress (1993). Language as Ideology. (2nd ed.). London: Routledge
- Kress, Gunther (1990). Critical discourse analysis. Annual Review of Applied Linguistics. Vol.11. Cambridge: Cambridge University Press. Pp.3-9, 11-13
- Van Dijk, T.A. (1998a). Critical discourse analysis. Available: <http://www.hum.uva.nl/teun/cda.htm>. (1/25/2000)
- Van Dijk, T.A. (1998b). Opinions and Ideologies in the Press. In Bell, Allan and Peter Garrett (Eds.). Approaches to Media Discourse. Oxford: Blackwell
- van Dijk, T.A. (1996). Discourse, Opinions and Ideologies. In Christina Schaffner & Helen Kelly-Holmes (eds.) Discourse and Ideologies. Clevedon: Multilingual matters Ltd, 1996. 7-37

- van Dijk, T.A. (1995). Discourse Analysis as Ideology Analysis. In Christiina Schaffner and Anita L. Wenden (eds.). *Language and Peace*. Dartmouth: Aldershot. Pp.17-33
Jaffer Sheyholislami - 14 - <http://www.carleton.ca/~jsheyhol/cda.htm>
- van Dijk, T.A. (1993). *Elite Discourse and Racism*. London: Sage Publications. Pp.242-282
- van Dijk, T.A. (1991). *Racism and the Press*. London: Routledge
- van Dijk, T.A. (1988a). *News Analysis: Case Studies of International and National*
- *News in the Press*. Hillsdale, N.J.: Lawrence Erlbaum Associates Van Dijk (1988b).
News as Discourse. Hillside, NJ: Erlbaum
- Widdowson, H. G. (1995). Discourse analysis: a critical view. *Language and Literature* 4 (3): 157-72
- Widdowson, H.G. (1998) *The Theory and Practice of Critical Discourse Analysis*.
Applied Linguistics, 19/1: 136-151
- Wodak, Ruth (2000a). *Discourses of Exclusion: a European Comparative Study: Speech at the Opening of the EU Observatorium, 7/8 April, 2000, Hofburg Vienna*. Available: <http://www.tuwien.ac.at/diskurs/stellungnahmen/Wodak5.html> (February 10, 2001)
- Wodak, R. & Ludwig, Ch. (Ed.) (1999). *Challenges in a changing world: Issues in Critical Discourse Analysis*, Vienna: Passagenverlag.
- Wodak, Ruth (1996). *Orders of Discourse*. New York: Addison Wesley Longman. pp.(1-21)
- Wodak, Ruth (1995). *Critical Linguistics and Critical Discourse Analysis*. In Jef Verschuren, Jan-Ola Ostman, and Jan Blommaert (eds.). *Handbook of Pragmatics-Manual*. Amsterdam/Philadelphia: John Benjamins Publishing Company. Pp.204-210.